Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1211 | 9-Cotmeh-2024 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

## Hest û têkoşîna ji bo govendê



**Navenda Nûçeyan**

Huner danasînek e. Bi tevgera laş ya ku dibe navgîneke çanda kevnar, ji bo jiyanê dibe cihê şanaziyê. Govend di çanda gelê kurd de cihek girîng digir e. Bi taybet jî çanda kevneşopî ye. Di heman demê de bi hest û têkoşîna xwe govendên xwe pêşkêş dikin. Yek ji komên govendê, koma şehîd Viyan Soran e. Koma şehîd Viyan Soran a girêdayî Tevgera Hîlala Zêrîn e. Ev kom bi hemû êş û zehmetiyan bi govendên xwe êşên gelê her çar parçeyên Kurdistanê di nava hestên xwe de dihewîne. Her wiha ji bo pêşkêşkirina çanda gelê her çar perçeyên Kurdistanê xebat didin meşandin.

Koma Şehîd (Viyan Soran) di sala 2017'an de li bajarê Efrînê hate avakirin. Endama Tevgera Hîlala Zêrîn û rêvebera koma Şehîd Viyan Soran Zeyneb Îbo ji ajansa me re axivî û got: "Koma Şehîd Viyan Soran li bajarê Efrînê dest bi lîstina dîlanan kir, di wê demê de zêdetirî 20 endaman piştî perwerdehiya giran pêk dihat û koman bi tevayî li navçeyên bajarê Efrînê govend gerand."

**'Ya em dixwazin ne ev ast e'**

Zeyneb di berdewamiya axaftina xwe de got: "Piştî ku em ji bajarê Efrînê koçber bûn piştî dagirkeriya dewleta Tirk, em hatin herêmên Şehba û ji bo ji nû ve zindîkirina hunerê me navendek taybet ji bo hunerê vekir. Tevgera Hîlala Zêrîn li herêmên Şehbayê hate berfirehkirin. Her wiha koma şehîd Viyan Soran ji nû ve hate avakirin hejmara wê jî 14 endam bûn." Zeyneb wiha pê de çû: "Em dikarin asta teknîkî ya komê baş binirxînin, lê ne ya ku em dixwazin ev e. Ji ber ku li herêmên Şehbayê em zehmetî dikêşin, bi taybetî jî dorpêç û peydakirina mamosteyan ji bo perwerdê zehmet e.

**Govendên ji çar parçeyên Kurdistanê**

Zeyneb da zanîn ku wan tevî hemû zehmetî û nebûna mamosteyan navber nexistine nav perwerdeya xwe û bi şev û roj xebitîne. Zeyneb da zanîn ku ew tevlî gelek bernameyan bûne û axaftina xwe wiha bi dawî kir; "Em beşdarî gelek şahiyan bûn, wek 8'ê Adarê, cejnên Newrozê û cejnên ku li herêmên Şahba û li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê tên lidarxistin, vê mehê me dest bi perwerdeyeke xurit li ser dîlanên herêmên Kurdistanê yên Amed, Botan û Serhedê kir. Her wiha me cihê xwe di festîvala 'Şehîd Berçem' a ku di 6'ê Îlonê de li bajarê berxwedanê Kobanê hate lidarxistin bûn. Em bi hêza xwe derdikevin ser dikê û tevahî govendên çar perçeyên Kurdistanê pêşkêş dikin."

## Bi dikaneke biçûk debara xwe dike



Bêrîvan Elî jineke temenê we 32 salî ye ji Amûdê ye. Bêrîvan Elî dikanek vekiriye û bi wê dikanê aboriya xwe ya xweser ava kiriye. Bêrîvan Elî ya 32 salî li bajarê Amûdê ya Kantona Cizîrê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê dijî. Bêrîvan Elî piştî ku dest ji karê mamostehiyê berda, xwest dikanekê biçûk veke û alîkariya malbata xwe bike. Bêrîvan Elî li ser vekirina dikana xwe ji ajansa me re axivî.

Bêrîvan Elî behsa destpêka vekirina dikana xwe kir û got: "Ev nêzî salekê ye min dikana xwe vekiriye. Berî ku ez dikana xwe vekim min li ser malpêra medya-ya dîjîtal pêdiviyên malan û yên jiyanî difirot lê bi alîkariya kesan û piştgiriyê min ev dikan vekir. Çiqas tu xweş û rûbiken bî ewqas kes tên ba te û ji karê te hez dikin."

**'Hemû pêdiviyên jiyanê di dikana min de hene'**

Bêrîvan Elî behsa zehmetiyên xwe yên destpêkê û tiştên ku di dikana xwe de difroşe kir û wiha berdewam kir: "Destpêkê dema ku min dikan vekir her tişt ji bo min zehme bû  her tiş li ser min zehmet bû û wiha berdewam kir: "Destpêka ku min dikan vekir her tiş li ser min zehmet bû, ji kirîn û firotinê min pir fêm nedikir û dema ku min tiştên dikanê dikirîn nirxên wan pir zêde bû lê bi demê re her tişt hêsan bû. Tiştên ku ez tînim dikana xwe, hema bibêje hemû pêdiviyên malan in. Dema ku dibe dema vekirina dibistanan jî pêdiviyên dibistanê tînim weke lênûs, pênûs, jêbir û çenteyan."

**'Hêza jinan ji bo kar heye'**

Bêrîvan Elî bal kişand ser karê jinan û armanca xwe ya bi kar wiha bi dawî kir: "Kar ji bo jinan ne şerm e ji ber ku jin jî xwedî wê hêzê ne dikarin kar bikin. Dema ku ez diçim cem bazirganekê weke jinekê bi hêz, îrade û bawerî, pêdiviyên dikana xwe dikirim. Ez dixwazim di pêşerojê de dikana xwe berfirehtir bikim û alîkariya gel bikim tiştan nîvê bihayê wan bifiroşim û gelek pêdiviyên din tê de bi cih bikim. Dixwazim ji her jinê re bibêjim, bila kar bikin ji ber kar ne şerm e û her jin xwedî wê hêzê ye, dikare kar bike û divê gotinên civakê li ser wan bandorê neke." **NÛ JINHA**

## Bi kamîreya ronahî




Dêrik- Çem Şeref

## NASA'yê qada elektrîkê ya li dora cîhanê keşif kir

Bi pêşengtiya NASA'yê komeke lêkolînvanên zanyar, qada elektrîkê ku dora cîhanê tev dipêçe û hebûna wê xwe dispêre teoriya berî deh salan, hat keşifkirin.

Bi pêşengiya NASA'yê komeke lêkolînvanên zanyar, ragihandin ku di encama lêkolîna wan de qada elektrîkê ku dora cîhanê dipêçe hatiye keşifkirin.



Li gorî meqaleya nû ya di kovara zanistî Nature de hat weşandin, keşf bi saya daneyên ji roketa Endurance ya NASA'yê gengaz bû. Amûra fezayê ya di Gulana 2022'yan de hat firandin, bi qasî 770 kîlometreyî xwe gihand bilindahiyê û li qadê guhertinên giraniya elektrîkê hate pîvandin. Lêkolînvan ji bo vê keşfa ku hatiye piştrastkirin, weke 'qada elektrîkê ya ambîpolar' binav dikin. Tê texmînkirin ku ev diyarde di gerdûna sîstema Cîhan û Rojê de roleke girîng dilîze.

## FERHENGA BIWÊJAN

**Çima nekene?**
- Bextiyar e; her tişta wî bi dilê wî ye; daxwaziya wî pêk hatiye.

**Daxwaziya kor du çavên reş in:**
- Keyfa min xweş bû; vê agahiya te ez dilşa kirim; min jî tişteke wisa dixwest.

**Destê camêran nayê girtin:**
- Ku tu bikî bike; ti kes nabêje te neke.
(Dema yek dibêje; ezê tişteke baş bikim derbarê wî de tê gotin)

**Devê wî çû pişta guhên wî:**
- Keyfa wî pir hat.

**Devê wî gihat pişta guhê wî:**
- Bi heman wateyê.

**Di bin simbêlên xwe de kenî:**
- Keyfa wî hat.
(Dema tiştekî ken bê gotin, yan kirin, yan jî dema tişteke li xweşa mirov biçe bê gotin û mirov berken bibe, hingê tê gotin)

**Dilê min çarkopal lê xist:**
- Ji keyfa kelecanê ez girtim.

**Dilê min çarpîne lê xist:**
- Ji keyfa ez mest bûm.

**Dil ji min bir:**
- Dilê min borand; ez mest kirim.

**Dil ji me çû:**
- Em mest bûn.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## Li dijî pergala îşkence û qirkirinê pêngava cîhanî didome



Pêngava Cîhanî ya azadiya Rêber Apo saleke tijî xebat li dû xwe hişt. Hevserokê KCDK-E Engîn Sever diyar kir ku di nav salekê de di hemû qadên ku wan xwe têde birêxistin kiribû, perspektîfa hemlê kir bingeh û li gor wê xebatên dîplomasî û çalakiyên heyî gihandin armancên wan.**R-5**

## 'Bi saya fikirê Rêber Apo jin bû bingeh û dengê civakê'



Endama Meclisa Giştî ya TEV-DEM'ê Rûken Ehmed diyar kir ku bi hatina Şoreşa 19'ê Tîrmehê re û pêkanîna sîstema Rêveberiya Xweser re jinê karî roleke gelek mezin bilîze û cihê xwe di gelek qadan de bigre.**R-2**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1211 | 9-Cotmeh-2024 | www.ronahi.net/ku/ | Nirx: 500 L.S

## Pêngava Cîhanî ya azadiya Rêber Apo derbasî sala 2'emîn dibe




Pêngava "Ji Rêber Apo re azadî ji pirsgirêka Kurd re çareserî" ji 74 navendên cuda yên cîhanê di 10'ê Cotmeha 2023'an dest pê kir. Herwiha îro dikeve sala xwe ya duyemîn, di pêngavê de nûnerên sendîkayên siyasî, parlementer, çalakvan, saziyên civaka sivîl û kesên xelata Nobel a aştiyê bidestxistine beşdar bûn.**R-6**

## LI HEMBERÎ KOMPLOYA NAVNETEWEYÎ PÊNGAVA AZADIYA CÎHANÎ

Komploya Navneteweyî ku di 9'ê Cotmeha 1998'an de li dijî Rêber Abdullah Ocalan hat destpêkirin û heta niha dewam dike, ne tenê ji bo têkbirina têkoşîna azadiyê ya gelê kurd e, ew êrişeke îdeolojîk û polîtîk ya li dijî  xeta azadiyê ya Rojhilata Navîn hatiye amadekirin û tunekirina jiyana azad ji xwe re kiriye armanc. Endamê Desteya Hevserokatiya PYD'ê Aldar Xelîl diyar kir ku komploya navneteweyî ya 9'ê Cotmehê domandina qirkirina gelê herêmê ye.**R-4**



## Ji bîrdanka Nûriyê Hesarî 5 berhem diyarî pirtûkxaneya kurdî bûn



Dîwana Mele Nûriyê Hesarî ya 3 û 4'an, Axlîma Pêlên Helbesta Kurdî, Zanhaweya Pêxember, Hostanîbêja Zarhawayên Kurdî bi tevahî berhemên ji bîrdanka wêjeyî û çandî ya Nûriyê Hesarî ne.**R-7**

## 26 sal in Rêber Apo li hember hêzên komploger têkoşînê dike




Di 9'ê Cotmeha 1998'an de komployeke navneteweyî li dijî Rêber Apo dest pê kir. Ev komplo di şexsê Rêber Apo de li dijî kurdan, Kurdistanê û Rojhilata Navîn bû. Bi vê komployê xwedayên bêrehim û zordest, xwestin heqîqetê di bazarên xwe yên bêhinpêketî de pêşkêşî berjewendiyên serweran bikin.**R-3**

Şêweyên zayendperestiyê gelekî kirêtin — Nehir pale — R-2
Alozî kûr e û tekane rêya çareseriyê Xweseriya Demokratîk e — Dilyar Cizîrî — R-4
Bi Komploya 9'ê Cotmehê serdema Şerê Cîhanî yê 3'emîn hat amadekirin — Zekî Bedran — R-5
Komplo, şerê Sûriyê, şerê Îsraîlê — Farûk Sakik — R-5
Peymangeha Bilind a Hunerî hêviya hunermendên pêşerojê — Kemal Necim — R-7

# Bi saya fikirê Rêber Apo jin bû bingeh û dengê civakê

Endama Meclisa Giştî ya TEV-DEM'ê Rûken Ehmed diyar kir ku bi hatina Şoreşa 19'ê Tîrmehê re û pêkanîna sîstema Rêveberiya Xweser re jinê karî roleke gelek mezin bilîze û cihê xwe di gelek qadan de bigre.

**Ayşa Silêman/Qamişlo**



Di derbarê rola jinê di sîstema Rêveberiya Xweser de endama Meclisa Giştî ya TEV-DEM Rûken Ehmed bersiva pirsên Rojnameya me d û hevpeyîvên wiha bû:

**Di sîstema Rêveberiya Xweser de cihgirtina jinê çawa dest pê kir û niha di çi astê de ye?**

Sîstema Rêveberiya Xweser ji bo giştî Sûriyê û bi taybet ji bo herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê sîstemeke civakî ye, hevbeşbûna civakê hemû bihev re ye, hemû pêkhate jî cihê xwe di nav vê sîstemê de digirin. Ev sîstem li hemberî sîstema desthilatdar û sîstema dewletê ya ku civak zuha kiribû hebûn û îradeya wê binpê kiribû, yek ziman û yek çand tenê bû ev yek bandorekî mezin li gel dikir. Lê sîstema Rêveberiya xweser mafê herkesî da wan ku bi ziman û çanda xwe xwenas bikin, bi taybet rola jinê di vê sîstemê de hebû. Di sîstema Netewa Demokratîk de bi taybet di fikir û ramanên Rêber Apo de jin di nava civakê de wê çawa xwedî rol bê û civaka ku hebûna jinê tede tune bê wê ew civak winda bê. Her wiha ji destpêka avakirina Rêveberiya Xweser Desteya jinê jî hat avakirin, hemû jinên ku di rêveberiya xweser de cih digirtin, li desteya jinê vedgeran dema rastî pirsgirêk û newekheviyê dihatin. Destpêka ku Rêveberiya Xweser hat avakirin di nav sê kantonên wê yên heyî de serokê meclisan hebûn wek herêma Efrînê serokê wê jin bûn, vê yekê bandoreke mezin kir ku jin çawa di Rêvebriya Xweser de xwedî role û xwedî mafe ku di hemû aliyên jiyanê de cihê xwe bigre. Zemînekî pir xurt hebû ku fikir û ramanên Rêber Apo ku ev bîst salin ku di Sûriyê de maye û bi hezaran mirov perwerde bû li ser vî fikirî û pêşket. Lewra bingehekî gelekî xurt hebû ku di herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê de sîstema Rêveberiyta Xweser yekser kete piratîkê û him jî rola jinê gelekî bamdor kir bi taybet di alanên me yên rizgarkirî de, ev alanên ku piraniya wan pêkhateyên Eebin bû wek Minbic, Tebqa, Reqa û Dêrazor, vê sîstemê him bandor û him jî gelek guhertinên bir biçav kir li van alanan û sîstema hevserokatî li wir bicih bû. Di milê sîstemê de em niha di nava şerekî gelekî giran de ne, ev yek jî bi taybet him li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê him jî tecrîda girankirî li ser Rêber Apo. Pêwîste li hember şerê ku tê kirin û koçberiya ku li ser warê me tê kirin, şerê taybet û sîxurtiya ku dijmin dixwaze li ser me feriz bike û bi destê jinan sîstemê hilweşîne, her wiha hemû hewildanên xwe dike ku jinan wek sîxuran bikar bîne. Li hember van hemûyan em baldarbin û li ser fikir û felsefeya Rêber Apo têkoşîna xwe zêde bikin da ku em bikaribin vê sîstemê bidin rûniştandin û bi reng, siyaset û aboriya jinê.

**Sîstema hevserokatiyê ya Rêveberiya Xweser bandoreke çawa li ser jinê kir?**

Sîstema hevserokatî bandorek mezin kir ji ber ku sîstemeke hevbeşe, di milê jinê de jî gelek baldare, di heman demê de sîstema hevserokatî wekhevî têde heye, mêrek nikar diderheqê jinan de biryar bigre. Lê dema di jiyanê de hebeşîbûn hebe, bi hevre girtina biryaran çi di milê rêxistinî, siyasî, aborî, civakî de hebe, ev yek bandoreke gelek mezin dike û kir jî, hişt ku ev sîstem bala tevahî cîhanê bikşîne. Li gelek welatan cara yekem dibhîstin bi sîstema hevserokatî, heta niha jî di Kurdistanê de ji bilî hereketa azadiyê ji bilî firkir û ramanên rêber Apo mirov dikare bêje ku ev sîstema hevserokatî li cem nîne. Dema mirov bala xwe bidiyê ku di welatekî de biryara wezaretê tê dayîn ji nav hijmare mezin ji mêran de tenê çend jin hene, ev yek bixwe re bê edaletî tîne ji bo vê yekê bi taybet di hevpeymana civakî de jî ev nêzê 13 sala ye sîstema hevserokatî tê pêkanîn. Sîstema hevserokatî di nava civakê de bawerîk daye avakirin, ji ber ku civak dizane çi biriyara ku derdikeve nêrîna herdû zayendan digre dest. Herwiha dema hin kes ji derveyî welat tên û sîstema hevserokatî dibînin diçin li welatê xwe jî vê yekê nîqaş dikin. Ev sîstem bandor li herkesî kir û bi taybet li jinê kir ji ber ku jin di nav zihniyeta baviksalarî hatibû perçiqandin, nêrîna wê ji bo wê, malbat û civaka wê nebû. Loma vê sîstemê hişt ku jin bibe berpirsiyar û rahişt barê civakê û li gor wê rola xwe lîst.

**Astengiyên ku jin rastî wê hatin îi ne û heta çi astê wê dikarî van astengiyan derbas bike?**

Gelek astengî di pêşiya jinê de bûn kelem, ji ber ku hertim jin ya duyemîn hatibû dîtin, him di milê dayîna nêrîn, parastin, aborî û cihgirtina wê di nava siyasetê de, hertim jin hatibû paşguh kirin, jin wek amûrekî dihat dîtin. Ji bo vê yekê têkoşîneke pir mezin hat dayîn. Rêber Apo destpêka 2013'an de wiha got: " Şoreşa Rojava bû Şoreşa jinê" yanî bi pêşengtiya jinê tê meşandin. Dema ku bahozên desthilatdariyê ser wan de were wê bikaribin xwe biparêzin. Ji ber ku desthilatarî gelekî xirabe, sedema desthilatdariyê nêzîkatiyên cûr bi cûr tên kirin. Lê bi tevlîbûna jinê ji sîstemê re mirov dikare bêje tirsek di desthilatdariya mêr de da avakirin, jinê bi riya vê sîstemê ji mêr re isbat kir ku ew jî dikare cihê xwe wek wî di gelek qadan de bigre. Bi fikir û ramanên Rêber Apo tevlîbûna wê ji vê sîstemê re hat çêkirin, ji bo parastina vê sîstemê û pêkanîna wê li dijî desthilatdaran jinê bedêlên gelek mezin dan. Di heman demê de bi hezara jin gihan asta şehadetê, bi hezara berxwdaniyê dikin di zindanan de û rastî şidet û destdirêjahiyê tên. Ev hemû têkoşîna azadiyê tê meşandin, ji bo vê têkoşînê mirov wê bedêlên gelek mezin bide di heman demê de Rêber Apo jî dibêje; Bedêlên azadiyê gelekî mezinin, heger azadî rehet ban Roahî û Bêrîvan bedena xwe nedidan. Loma li hember dewleta dagirker û hevalbendên wê bihezaran jin gihan asta şehadetê û birîndar bûn. Îro roj jin pêşenga civakê ye derdor li jinê dinêrin ya xwedî hêvî û vîn e. Her wiha dema jin cihê xwe di milê parastinê de digre, civak ji wî cihî pişt raste. Ev yek bi têkoşînê re hat guhertin ne bi rehetî bû, mînaka herî berbiçav gava mêr raporên xwe dinvîsin û xwe pêşinyar dikin da ku di perwerdeyên xweser re derbas bibin û vî hizr, dîrok û hêza li cem jinê nas bikin. Her wiha mêr li hember jinê şaşîtiyek kiribe rexnedayîna xwe dide lê dema berê de ev yek nebû li cem mêran. Lê îro roj bi fikir û ramanên Rêber Apo ev yek pêk hat.

## Ji Pênûsa Jin

### Şêweyên zayendperestiyê gelekî kirêtin

Nehîr Pale

Pirsgirêka zayendperestî bandorê li ser hemû pirsgirêkên civakî dike. Di encama hemû pirsgirêkan de lihevnekirin, pevçûn û şer çêdibin, jin û zarok jî dibin qurban. Cudahî xistina navbera jin û mêr de û bi rêbazên tûnd nêzî jinê bûyîn ne tenê li malbatê heye. Li hemû ciyên pîroz, dibistan, nexweşxane, bazar û kolanan ev cudahiya di navbera jin û mêr de heye. Mînak heyanî niha qedexe ye ku jin nêzî mizgeftan bibe, wexta ku mirî têne veşartin nabe jin amade be. Ji xwe li şîna miriyan cî ji jinan re nîne, tenê ciyê mêran heye. Jin jî li kûderê şîna xwe bikin ne girîng e.
Her wiha ji bo jin bixwînin û xwendina xwe berdewam bikin her roj ji aliyê malbata wan û civakê ve îhanet li wan tê kirin. Niha keçik temenê wê dibe 6 salî û ji ber ji malê derdikeve û diçe dibistanê divê serê xwe bigre. Hemû şagirtên keç serê xwe digrin û wiha têne dibistanê. Mamoste jî weke zarok li wan nanêre, çawa nêzî jinên bi temen mezin dibin wisa nêzî keçên temen biçûk jî dibin. Mamoste dema ku wane xwe didin berê xwe nadin aliyê keçikan. Keçikên biçûk li dibistanan fêrî qaliban dikin û mejiyê wan felc dikin. Ji xwe hejmareke mezin ji mamosteyan dema ku têne dibistanê û wane didin zarokan nîqab bikar tînin. Tiştên ku malbata zayendperest ew fêrkirine derbasî şagirtên xwe dikin.
Li nexweşxaneyan jî nabe ku jin biçe gel bijîjkên mêr. Carne temenê hinek jinan 50`î derbas kiriye yan jî temenê keçikan 6 salî ye dîsa malbat wan nabe gel bijîjkên mêr. Divê mêr destê xwe nede canê jinê û pêre ne axivê. Ji ber vê yekê dema ku hinek malbat keçên xwe bibin gel bijîjkên mêr ew bijîjik bi riya mêrên ku bi wan re çûne hewl didin nexweşiyên wan fêm bikin û pirsgirêkên wan ên tendurustî çareser bikin. Gelek caran bijîjkên mêr nexweşiyên jinan fêmnakin û wisa derman ji wan re dinivîsîn in. Mamosteyên mêr, bijîjkên mêr ango mêr bi giştî rêbazên ew bi jinê re didin bikar anîn gelekî zayendperest in. Di têkiliya mêr a bi jinê re gelekî seqetî hene. Jin jî weke her tiştî mulkê mêr e. Mêr çawa dixwaze jinê bide bikar anîn û nêzî wê bibe kesek wî lêpirsîn nake yan nêz nabe. Mêr li gorî zîhniyet û piskolojiya xwe nêzî jinê dibe û zagonan jêre datîne. Hemû jî di bin navê şeref û namûsê de têne kirin. Pêwîste ku kesek namûsa wî nebîne, dengê wê nebhîze û destê xwe nediyê. Heyanî niha di bin navê ol de hinek mêr li ser hevjîn û keçên xwe qedexe dikin ku derbikevin bazarê, ew pêdiviyê wan pêktînin û jin gelekî kêm ji malê derdikevin.
Mêr her tiştê ku dixwaze rewa kiriye û tiştek ji bo wî ne qedexe ye. Lê belê her tiştê girêdayî jin be eybe tê dîtin. Di encama zexta li ser jinê her tim jin fedî dike û ditirse. Heyanî ku dimrê hesabê gotinên xelkê, malbat û hevjînê xwe dike.



# Ji bîrdanka Nûriyê Hesarî 5 berhem diyarî pirtûkxaneya kurdî bûn

Dîwana Mele Nûriyê Hesarî ya 3 û 4'an, Axlîma Pêlên Helbesta Kurdî, Zanhaweya Pêxember, Hostanîbêja Zarhawayên Kurdî bi tevahî berhemên ji bîrdanka wêjeyî û çandî ya Nûriyê Hesarî ne. Ev berhem jî xwedî naverokên cuda, bi beşên wêjeyî yên cihêreng in û tîpên wan li benda çavên xwîneran e.

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

Helbestvan û zimanzan Mele Nûrî Hesarî navê wî yê rastî Nûrî kurê Yûsifê Umer e. Ew di sala 1934'an de li Bakurê Kurdistanê, gundê Hesarê yê girêdayî Kerecosê ji dayik bûye. Helbestvan û zimanzanê Kurd Mele Nûriyê Hesarî di sala 1934 an de li gundê Hesarê yê girêdayî Kerecosê ji dayik bû. Ji destpêka sala 1967'an ve, Mele Nûriyê Hesarî li bajarê Qamişlo dijiya û di sala 2011'an de koçkiriye. Piştî oxirkirina jiyanê, Hesarî gelek berhem ji bo gelê kurd hîştin, berhemên wî tev destnivîs bûn û li gel malbatê bûn.
Îsal jî 5 berhemên wî li Qamişloyê hatin çapkirin, ew jî ev in: Dîwana Mele Nûriyê Hesarî ya 3 û 4'an, Axlîma Pêlên Helbesta Kurdî, Zanhaweya Pêxember, Hostanîbêja Zarhawayên Kurdî.
Girêdayî berhemên Mele Nûriyê Hesarî yên ku hatine çapkirin, kurê wî Ebdilwehab Umer ji rojnameya me re axivî.

**Dîwanên wî**

Ebdilwehab di derbarê dîwanên Mele Nûriyê Hesarî de wiha got: "Mele Nûriyê Hesarî di 20 saliya temenê xwe de rahişt pênûsa helbestê, ji wî temenî ve heta ku nexweş ket helbest bi kurdî dihûnandin. Hemû helbestên wî destxet bûn û nehatibûn çapkirin. Bi destpêka sala 2024'an re du dîwan bi cildê 1 û 2'yan hatin çapkirin. Mijarê helbestên wan herdu dîwanan li ser evînê, welatperweriyê, welat, neyarên kurdan, olê, şoreşên kurdan, felsefeya jiyanê û hwd… in. Wî bi terzê kilasîk dinivîsandin. Dîwanên dawî yên cildê 3 û 4'an piraniya xwe li ser netewperweriya kurdî bû. Di van dîwanan de li ser netewa kurd, êşa kurdan, rexnekirina şêxê kurdan, rojên netewî û hwd… rawestiyaye



û mijaran vedibêje. Di dîwana 3'an de 48 helbest bi navnîşanên cuda hene, ew çapa yekem e, li çapxaneya Benyan hatiye çapkirin. Di dîwana 4'an de 64 helbest bi navnîşanên cuda hene û ew çapa yekem e, li çapxaneya Beyan hatiye çapkirin."

**Axlîma Pêlên Helbesta Kurdî**

Umer têkildarî pirtûka Axlîma Pêlên Helbesta Kurdî wisa anî ser ziman: "Ev berhem li ser pêlawaza helbestî ye. Şêwazê kitekirin û dahurandina helbesta kurdî ya kilasîk, di vê berhemê de bi zelalî tê şîrovekirin. Wekî tê zanîn helbesta kurdî ya kilasîk xwedî zanist, sazbend, pêl û rêç e, hem jî hevgirtî ye. Lewma jî divê xwedî rêgez û binyad be, binyad û bingeha şîrovekirina pêlawaza helbestê di vê berhemê de tê dîtin. Nûriyê Hesarî helbestvanekî jî bû ji ber vê yekê jî bi berfirehî li ser van xalan rawestiyaye. Ev berhem çapa duyem e, li çapxaneya Mîran hatiye çapkirin."

**Hostanîbêja Zarhawayên Kurdî**

Umer pirtûka bi navê Hostanîbêja Zarhawaya Kurdî bi vî awayî pênase kir: "Berhema Hostanîbêja Zarhawaya Kurdî, berhemeke ji bo zimanê kurdî ji aliyê zimannas Mele Nûriyê Hesarî ve hatiye çêkirin. Wî di wê demê de mijarên rêziman xistibûn mijara nivîsînê. Wî bi hurgilî li ser tîp, peyv, hevok û beşên ziman yên din rawestiyaye. Li gorî kesên ku ev pirtûk xwendine, hêjayî gotinê ye ku wane û semîner li dibistan û saziyên perwerdeyî werin dayîn. Ev berhem di sala 1996'an de li Stokholmê ji hêla Zeynelabdîn Zinar ve bi çapa yekem hatiye çapkirin. Herwiha îsal jî ji aliyê Yekîtiya Hesariyan ve bi çapa duyem çap bûye."

**Zanhaweya Pêxember**

Ebdilwehab Umer, berhema Zanhaweya Pêxember wiha nasand: "Ev berhema bi navê Zanhaweya Pêxember, di derbarê zayîna Pêxemberê Xwedê, Muhemed de ye. Peyva zanhawe bi zimanê erebî tê wateya mewlûd ango zayîna Pêxember. Bavê min di vê berhemê de bi rengekî helbestî û bi pêlawazî pesna Pêxemberê Xwedê dide. Mirovê awazjen û bizanibe mewlûda Pêxember vebêje, ew ê bi awayekî sirûdî Zanhaweya Pêxember bixwîne. Ev pirtûk çapa yekem e, li çapxaneya Beyan çap bûye."

**Armanc ji çapkirina berheman?**

Ebdilwehab derbarê armanca çapkirina berhemên Nûriyê Hesarî de wiha axivî: "Armanca sereke ji çapkirina me ji berhemên mavê min, ew ku Mele Nûriyê Hesarî bi raman û pirtûkên xwe zindî bimîne û xewna çapkirina berhemên wî bi cih were. Li aliyekî din jî pirtûkxaneya kurdî zengîn bibe û xwîner sûdê jê bigirin. Di warê berhevkirin û çapkirinê de em hinekî astengdar bûn. Bi rastî pirtûkên wî tev destxet bûn û hêza me ya madî tune bû ku em wan çap bikin. Li aliyê din jî tu deste, sazî û navendên çandî û wêjeyî yên Rojavayê Kurdistanê di warê çapkirinê de bi me re nebûn alîkar. Lê piştî ku derfeta çapkirinê bi me re çê bû, min bi xwe ev berhem çapkirin. Mamoste Dilawer Zengî di hêla berhevkirin, sererastkirin û komîhevkirina wan de bû alîkar û keddeke mezin da, em sipasiya wî dikin. Herwiha sipasiya Yekîtiya Hesariya dikin ku wan jî barê çapkirina pirtûka Hostanîbêja Zarhaweyên Kurdî hilgirt ser milê xwe û jê jî hezar pirtûk çap kir. Berhemên din min bi xwe çap kirin, herdu dîwan 400 hejmar û berhema Axlîma Pêlên Helbesta Kurdî 200 pirtûk hatin çapkirin, berhema Zanhaweya Pêxember jî 300 pirtûk. Tevahiya pirtûkan jî hatin belavkirin û hîna jî em ê li kantona Cizîrê bi ahengên îmzekirinê belav bikin. Hêjayî bibîrxistinê ye ku ji meha 5'an ve xebata berhevkirin û çapkirinê dihat kirin."

**Berhemên mayî yên ku nehatine çapkirin**

Ebdilwehab Umer girêdayî berhemê neçapbûyî yên Mele Nûriyê Hesarî wisa got: "Dema ku bavê min dinivîsand di heman demê de bi armanca çapkirinê, berhemên xwe didan kesên derdorê. Lê gelekan berhemên wî dibirin, çap nedikirin û ji xwe re dibirin. Li aliyekî din gelek berhemên bavê min li gel me hene lê em nizanin ku ev berhem çi ne. Ew destnivîsin, dema ku mamoste Dilawer ev destxetên bavê min dîtin, anî ser ziman ku nêzî 7 pirtûkên din ji van destxetan derdikevin. Ji wan berheman ferhenga kurdî-kurdî, ya zaravayên kurmancî-zazakî û ya kurdî-Tirkî ne. Di demeke nêz de wê mamoste Dilawer wê careke din wan berheman berhev bike. Em bi hêviya ku xwînerên pirtûkan sûdekê ji van berheman bigirin, gelê kurd xwe hîn bêhtir ronî bike. Bavê min hertim digot eger kurd ziman û çanda xwe biparêze ew ê dijmin ticaran nikaribe serî li wan bitewîne, eger bi tang û topan jî êriş bike, komkujiyan pêk bîne, dema ku ziman û çand parastî be dijmin wê nikaribe tiştekî bike."

# Gor A Zinde

**Lema Elî**

"Ku raman ronî be hukmê tariyê tune ye"
Di romana Gor a Zinde ya nivîskar Ciwan Serhediyan de li ser dû rêhevalane ew heval feqetiyê dikin, di rêwîtiya herdû hevalan Selhedîn û Emer ku her yek ji gundekî cuda ne, di vê rêwîtiyê de berfeke dijwar dibare, ku bandorê li Selhedîn dike û dibe sedema ku lingên wî reş dibin û piştî demekê dimire. Dilsoziya herdu hevalan dibe sedema ku Emer derbasî mala Selhedîn dibe û ji xwîşka Selhedîn hez dike, paşê bi xwîşka hevalê xwe re dizewice, keç jî navê wê Xecê ye.
Evîneke pir mezin di navbera wan de çê dibe ku ev evîn dibe sedema herkîna bûyerên di romanê de. Di vê romanê de evîna ku zindî dimîne, rê û rêbazên jiyana civakê bi taybet li Serhedê, hevaltî û dilsoziya wan hevalan bi hev re, şer û pevçûnên di navbera du malbatan de ku dibe sedema kuştin û talaniyê, ev herdu malbat yek jê malbata Emer e û ya din jî malbata Miko ye ku malbata Miko bixwe malbateke ermenî ye û zêdetirî 50 saliye ev herdû malbat di heman gundî de bi hev re dijîn, di vê bêtifaqiyê de Emerê ku di nav hemî gundiyan de dihat hezkirin hate kuştin, ew Emerê ku weke lehengê romanê hatiye diyarkirin, paşê gora wî weke gora Şêx Emer di nav gundiyan de dihat binavkirin.
Bi dû kuştina Emer re hevjîna wî Xecêya ku ducanî bû bi birayê hevjînê wê re tê mehir kirin, tevî vê yekê Xecê her dilsoza Emer dimîne û her gundî wê li ser gora Emer dibînin ku bi gorê re diaxive. Her wiha di vê romanê de li ser birina xortên kurdan ji bona leşkeriya bi darê zorê ji aliyê osmaniyên desthilatdar ve dihat ferz kirin tê nîşandan.
Romana Gor a Zinde, şêwazê hûnandina di vê romanê de pir hesan e, weke ku mirovek bûyereke ji rêzê ji kesekî din re dibêje, ew teşwîq, balkişandin, rîstina hevokan ne hewqas bi hunera nivîsandina romanekî hatiye nivîsandin ku ji kesê xwîner e weke nivîsandina çîrokekî hatiye afrandin, an ku qelsbûneke berbiçav di vê romanê de heye ku nivîskar romana xwe weke madeyeke xam li ser rûpelan raxistiye, ew hestên xemgînî, kêfxweşî û bi bandor negihandiye xwînerê vê romanê. Di dawiya romanê de nivîskar daye nîşandan ku ew bi xwe yek ji neviyên Emerê lehengê romanê ye. Di romanên rasteqînî de jî divê ku nivîskar bi hemî hêza pênûsa xwe hewl bide ku di hûnandina hevokan de ji xeyal, hestên bandorkar, gihandina namayekî bi wate bighîne xwîneran, lê ev yek di romana Gor a Zinde de lawaz tê dîtin.




## Têbînî



### Peymangeha Bilind a Hunerî hêviya hunermendên pêşerojê

Kemal Necim

Ji ber rewşa qedexe û çewisandina li ser çand û zimanê kurdî, derfeta ku civaka Kurd li Rojava di der barê cureyên hunerê de perwerde bibe kêm bûn, lewma piraniya karên hunerî, bi taybet di beşên mûzîk û şano û sînemayê de weke hewildanên takekesane pêş ketin. Her çiqas hin ezmûnên bi bandor jî derketin, lê her weke hunerke ne ekademîk dihate tomarkirin.
Piştî pêvajoya şoreşê derfetên berferh vebûn ku ev qadên hunerê bi serbestî, bê çewisandin pêş bikevin. Li gorî derfetan di nava 10 salên dawî de ta radeykê li qadên hunera mûzîk, şano û sînemayê hinek liv û tevger çêbû û ji bo birêxsitinkirina kar û barên hunerî hin dezgeh û saziyên taybet yên her beşekî hunerî hatin avakirin. Mîna navend û komên mûzîkê û komînên şano û sînemayê.
Heta niha bi rêya van dezgehan bi dehan berhem hatin afirandin. Bi dehan stran û videoklîp hatine tomarkirin, her wiha bi dehan lîstikên şanoyê hatine lîstin û tomarkirin û pêşandan, di hêla sînemayê de hin hewildan çêbûn û hin film rêzefilm hatin e çêkirin. Lê dema ku rexnegêr yan civak van berheman datîne ber çavên nirxandin û rexneyê, her diyar dibe ku tiştekî kêm û netekûz heye. Dê peyvên stranê baş bin lê awaza wê qels e, awaz baş be peyv yan ritim yan dengê stranbêjan kêm û qels e. Di hêla şanoyê de jî wiha ye, mirov nikare ta niha behsa pêşandaneke şanoyê bike ku salekê hatiye pêşandan. Tê zanîn ku şanoyên serkeftî caran bi salan têne pêşandan û bi dihên salan di bîra civakê de dimînin. Her wiha heta niha her çiqas kurtefilm û rêzefilmên televizyonê û sînemayê hatine çêkirin, lê yek jî neketiye bîra civakê, ta niha karekterkî kurdî ji filmekî yan rêzefilmekî nehatiye naskirin di nava civakê de, tevî ewqas derfetan jî, lê xelkê ji bo herin rêzefilmeke kurdî temaşe bikin berê xwe ji rêzefilmên erebî yan tirkî veneguheztine. Her wiha heta niha navê filmekî sînemayê yê Kurdî neketiye ser zimanê civakê.
Dema ku rexnegir û civak van tiştan dipirsin, bersiva herî nêzîkî ziman ew e ku xebatkarên pispor tune ne, kesên ku di şano û filman de dilîzin ne pispor in û di perwerdeyên ekademîk re derbas nebûne. Her çiqas li gelek navendên çandî de carê ji bo demên kurt korsên perwerdeya hunerî, di mijarên şano û sînema û mûzêkê de têne vekirin jî, lê ew nabin egera avakirina hunermendên pispor, her wiha cihê perwerdeya akademîk ya demdirêj û sistematîk nagire.
Eger mirov van hêman û egeran bîne ber çavan wê baş têbihêje bê çima damezrandin û vekirina Peymangeha Bilind a Hunerî girîng e û gaveke li pêş e. Ev peymangeha ku tê payin vê salê dest bi sala yekem ya perwerdeyê bike, dê bibe gava pêşîn li Rojava. Ku li Rojava êdî şagirt dikarin bi awayekî sistematîk û demdirêj (3`ê sal) di beşên mûzîn û şano û sînemayê de perwerde bibim û dilplomayan wergirin. Titşa pir girîng ew e ku aliyên têkildar hîna ji destpêkê de, mamosteyên pisopr û têgihiştî payda bikin da ku nifşekî hunermendên behremend û ekademîk were avakirin.

# Pêngava Cîhanî ya azadiya Rêber Apo derbasî sala 2’emîn dibe

Pêngava “Ji Rêber Apo re azadî ji pirsgirêka Kurd re çareserî” ji 74 navendên cuda yên cîhanê di 10’ê Cotmeha 2023’an dest pê kir. Herwiha îro dikeve sala xwe ya duyemîn, di pêngavê de nûnerên sendîkayên siyasî, parlementer, çalakvan, saziyên civaka sivîl û kesên xelata Nobel a aştiyê bidestxistine beşdar bûn. Li gelek weletan pêngava komkirina îmzeyan û xwendina pirtûkên Rêber Abdullah Ocalan hatin lidarxistin.

**Têkoşîn Amara/ Qamişlo**

Pêngava ku li 74 welatan di sala 2023’an de ji aliyê dostên Rêber Apo ve destpêkiribû û li hemû cîhanê belavbû. Pêngav bi daxuyanî, meşên dirêj, komkirina îmzeyan, xwendina pirtûkên Rêber Apo û çalakiyên birçîbûnê yên li girtîgehên tirkiyê û bakurê kurdistanê û gelek çalakiyên cur be cur bi durûşmeya “ji Rêber Apo re azadî ji pirsgirêka kurd re çareserî” hatin li darxistin.

### Pêngav heta azadiya fîzîkî ya Rêber Apo wê dewam bike

Dîlgirtina Rêber Apo li girava Îmraliyê, bêparhiştina ji mafên bingehîn ên mirovî dûrî hiqûqê ye, konseptekê siyasî ye ku dewama komploya navneteweyî ye. Tecrîd jî weke rewşa rojane ya vê yekê bi rengê sîstema êşkenceyê tê ferzkirin. Lewma têkoşîna ji bo rakirina tecrîdê, bi esasî jî daxwaza azadiya fîzîkî ya Rêber Apo armanca bingehîn a vê pêngavê ye. Ji ber vê yekê kesayetên navneteweyî yên ku pêngav dan destpêkirin, ne tenê şikandina tecrîdê di heman demê de israr dikin ku heta misogerkirina azadiya fîzîkî ya Rêber Apo pêngav wê dewam bike. Lewma pêngav ne ji bo çend mehan an jî demekê ye, pêngav xwedî wê taybetmendiyê ye ku demdirêj e. Bêguman girîng e ku daxuyaniya navendî ya pêngavê li Strasboûrgê hate kirin, pêngav li Ewropayê hate destpêkirin. Tê wê wateyê ku berpirsyariyên sîstema Ewropayê li bîra wê hate xistin, hevkariya wê ya li sîstema êşkenceyê ya Îmraliyê hate teşhîrkirin.

### Gele kurd li hemberê komployê têkoşîneke mezin dimeşîne

9’ê Cotmeha sala 2023’an de Dostên gelê Kurd li 74 bajaran daxuyanî dan çapemeniyê û pêngava ‘Azadî ji Abdullah Ocalan re, Çareseriya Siyasî ji Pirsgirêka Kurd re’ dan destpêkirin. Ji çar aliyên cîhanê, akademîsyen, rojnamevan, rêxistinên civakî yên sivîl, partiyên siyasî, parlamenter, aktîvîstên têkoşerên maf, fîlozof, kesên hêjayî xelata aştiyê ya nobelê hatine dîtin, nûnerên rêxistinên jinan û gelên xwecihî pêngava ‘Azadî ji Abdullah Ocalan re, çareserî ji Pirsgirêka Kurd re’ dan destpêkirin.

Rabûna tecrîda li ser Rêber Apo; bi destxistina şert û mercên bi tendurist, bi ewle û azad, xwestek û hewldanên sereke ye. Eger ku îro têkoşîna ji bo azadiya Rêber Apo asteke girîng bi dest xistibe, pareke girîng a Chomsky jî di vê yekê de heye ku bi dehan salan helwest û sekneke girîng raber kir. Chomsky ne tenê dostek e ku azadiya Rêber Apo û gelê kurd diparêze; li gel vê yekê ramangerekî mezin e ku nirx dide paradîgmaya Rêber Apo û ji bo nasandina vê hewldan kiriye.

### Têkoşîna gel li hemberê komployê berdewame

Bê guman di têkoşîna li dijî tecrîd û komploya navneteweyî de, gelê kurd berdêlên giran daye û têkoşîneke mezin meşandiye. Têkoşîna li dijî komploya ku dikeve sala 27’an, qet ne sekinî ye; bê navber heta roja îro dewam kir. Li gel têkoşîna gelê me, dostên gelê kurd û hêzên demokratîk ên li cîhanê û jin li dijî komployê rabûn û xwedî li Rêber Apo derketin. Bi taybetî jî hingî ku fikrên Rêber Apo ji aliyê rewşenbîr û derdorên demokratîk cîhanê ve hate naskirin, têkoşîna li dijî komployê jî mezin bû. Hîn bi xurttir xwedî li azadiya Rêber Apo hate derketin. Îro di serî de CPT saziyên navneteweyî yên ku têkildarî Îmraliyê berpirsyar in, zorî dikşînin û ketine wê rewşê ku nekarîn tecrîdê biparêzin. Di vê yekê de bandora helwest û têkoşîna rewşenbîrên li seranserî cîhanê, hêzên demokrat û jinan çêbûye.

### Pêngav wek giloka berfê li seranserê cîhanê belav û mezin bû

Li seranserî cîhanê pêngava ‘Ji Rêber Apo re azadî, ji pirsgirêka kurd re çareserî’ bandoreke girîng ava kir. ‘Rojên Xwendina Pirtûkên Rêber Apo’ ev pêngav hîn dewlemendtir kir. Niha jî ‘Rojên Diyaloga bi Rêber Apo re’ tê meşandin. Bi vî rengî Rêber Apo hîn baştir tê fêmkirin. Ev jî eşkere ye ku wê têkoşîna ji Rêber Apo re azadî, hîn xurttir bike. Hingî ku Rêber Apo hat fêmkirin, pêngava ji Rêber Apo re azadî mîna mezinbûna guloka berfê wê mezin bibe û ti kes wê nekare pêşî lê bigire. Ji vî alî ve domandin û mezinkirina pêngava ji Rêber Apo re azadî ya ku li seranserî cîhanê hatî pêşxistin, wê azadiya Rêber Apo nêz bike.

### Li gelek welatan pêngav bi daxuyaniyan hat destpêkirin

Di serî de li bajarê Strasbourgê yê Fransayê ku Konseya Ewropa, Komîteya Pêşîgirtina li Êşkenceyê (CPT) û Dadgeha Mafê Mirovan a Ewropayê (DMME) lê ne, ji bo temsîla temenê Rêberê Gelê Kurd Abdullah




Ocalan li 74 bajaran daxuyaniyên çapemeniyê hatin dayin.

Tevî welatên Ewropayê li Bangladeş, Pakistan, Tokyo, Hindistan, Kenya, Efrîka Başûr, Latîn Emerîka û bi dehan navendên din di heman demê de daxuyanî hatin dayin.

Ji çar aliyên cîhanê, akademîsyen, rojnamevan, rêxistinên civakî yên sivîl, partiyên siyasî, parlamenter, aktîvîstên têkoşerên maf, fîlozof, kesên hêjayî xelata aştiyê ya nobelê hatine dîtin, nûnerên rêxistinên jinan û gelên xwecihî pêngava ‘Azadî ji Abdullah Ocalan re, Çareseriya Siyasî ji Pirsgirêka Kurd re’ dan destpêkirin.

### Daxuyaniyên 74 welatan bi vî rengê bûn

“Kampanya ‘Azadî ji Abdullah Ocalan re, ji Pirsgirêka Kurd re Çareserî’ ya navneteweyî, tevgerên civakî, partiyên siyasî, şaredarî, sendîka, aktîvîst, rewşenbîr û bi milyonan Kurd û dostên wan ên li tevahiya cîhanê li dora armancekê digihîne hev. Ev armanc jî ew e ku Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan tevlî pêvajoyeke diyalogê ya nûkirî bê kirin, ji pirsgirêka Kurd re ku pirsgirêka sed salî ya Tirkiyeyê ye çareserî were dîtin.

Abdullah Ocalan rêberê gelê Kurd û nûnerê mirovahiyê ye ku li tevahiya cîhanê ji aliyê bi milyonan Kurdan û azadîxwazan weke nûner tê pejirandin.

Weke ku tê zanîn Rêber Apo di Sibata 1999’an de bi operasyonekê îstîxbaratî ya navneteweyî de hate revandin û radestî Tirkiyeyê hate kirin. Ji hingî ve girtî ye û bi salan têkiliya wî ya bi derve re hate qutkirin. Êşkence û kiryarên dij mirovî ên zalimane lê hatin kirin.

Tevî vê yekê jî tevgera ku Rêber Abdullah Ocalan ava kiriye û mirovên ku li pey şopa wî dimeşin û remanê wî ji bona xwe esas digrin, li refên herî pêş ên têkoşîna diyarkirina çarenûsa Kurdan û di nava tevgerên demokrasiyê yên pir etnîkî û olî yên li Rojhilata Navîn cih digirin. Teoriyên wî ji bo her kesên ku li tevahiya cîhanê ji bo diyarkirina mafê çarenûsa xwe, azadiya jinê û dawîanîna li newekhevî û mêtingeriyê bûye çavkaniya sûdwergirtinê.

### Mifteya aşitî û wekheviyê Rêber Abdullah Ocelan e

Pêngava ‘Azadî ji Rêber Apo re, çareserî ji pirsgirêka Kurd re’, weke ku ji navê wê jî tê naskirin, çareseriya pirsgirêka Kurd bi azadiya Rêber Apo pêkane, ji rewşa wî cuda nikare bê nirxandin û dest girtin. Ji bo azadiya Rêber Apo berê jî gelek kampanyayên cuda hatin destpêkirin. Gelek rewşenbîr, hunermend, akademîsyen, hiqûqnas, nûnerên saziyên sivîl û sendîka beşdarî van kampanyayan bûn. Mirov dikare bibêje ku pêngava dawî jî dewama wan e. Lê belê divê were gotin ku ji kampanya û çalakiyên berê berfireh û mezintir bû.

Di çarçoveya pêngava “Ji Abdullah Ocalan re azadî ji pirsgirêka kurd re çareserî” dostên kurdan li gelek navendên cîhanê, çalakiyên “Rojên Xwendina Pirtûkên Abdullah Ocalan” li dar xistin. Di çalakiyên xwendina pirtûkan de azadiya Rêber Apo xwestin û peyama; “Mifteya wekhevî, azadî û aştiyê Abdullah Ocalan e” dan.

Di çarçoveya pêngava “Ji Abdullah Ocalan re azadî ji pirsgirêka Kurd re çareserî” dostên Kurdan li gelek navendên cîhanê, çalakiyên “Rojên Xwendina Pirtûkên Abdullah Ocalan” li dar xistin. Di çalakiyan de çalakgeran beşên ji pirtûkên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan xwendin, fikrên wî nîqaş kirin û azadiya wî ya fîzîkî xwestin. Çalakgeran diyar kirin ku Abdullah Ocalan mifteya çareseriyê ye û gotin: “Mifteya wekhevî, azadî û aştiyê Abdullah Ocalan e. Wê tecrîd bê şikandin û gel azad bibin.”

Di çarçoveya pêngava azadiyê de li seranserê Ewropayê çalakiyên “Rojên Xwendina Pirtûkên Abdullah Ocalan” hatin organîzekirin. Akademîsyen, sendîkavan, nivîskar û siyasetmedarên tevgerên Kurdistanê eleqeyeke mezin nîşanî çalakiyên xwendina pirtûkên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan dan. Di çalakiya xwendina pirtûkan de beşên ji pirtûkên “Berxwedana Çandan“, “Sosyolojiya Azadiyê“, “Şaristaniya Kapîtalîst“ û “Azadiya Jinê“ hatin xwendin.

### Fikrê Rêber Apo bû gerdûnî

Fikir û paradîgmaya Rêber Apo êdî di asta navneteweyî de tê qebûlkirin, ku vê yekê bandor li pêngavê jî kiriye. Dema ku me karê vê pêngavê kir, me careke din dît ku fikir û felsefeya Rêber Apo li nava civakên derveyî me û derdorên akademîk gelekî bi bandor bûye. Gava ku mirov bala xwe bidin ser çalakiyên destpêkê yên pêngavê, wê ev bandor bi şênberî bê dîtin. Rojên xwendinê yên di meha Kanûnê de hatin kirin, mînaka herî balkêş ya vê yekê ye. Li çar aliyên cîhanê parêzname û pirtûkên Rêber Apo hatin xwendin. Ji gelek derdoran mirov tevlî van rojên xwendinê bûn. Ev yek jî nîşan dide ku fikrê Rêber Apo asoyekî nû dide tevgerên azadiyê û jinên ku li dijî sistema hegemonîk di nava lêgerînên alternatîf de ne. Û êdî Rêber Apo di asta gerdûnî de weke rêberekî tê dîtin. Di ser pêngavê re 4 meh derbas bûn. Di serî de welatên Ewropayê li çar aliyên cîhanê, li Bakurê Kurdistanê û li Rojava çalakiyên girîng hatin lidarxistin. Ji niha ve em dikarin bibêjin ku pêngav gihîştiye asteke girîng û baweriya me tam e ku wê azadiya Rêber Apo bi xwe re bîne.

### Dîlên azadiyê li girtîgehan jî tevlî pêngavê bûn

Li gel van çalakiyan, grevê birçîbûnê yên li girtîgehên Tirkiyeyê, li derve jî Nobeda Edaletê ya malbatên girtiyan, çalakiyên girîngbûn ku di çarçoveya pêngavê de hatin lidarxistin. Weke rêveberên vê pêngavê, weke gel û jinên Kurd; ji bo wan erke ku bibin dengê vê gireva birçîbûnê, li tevahiya cîhanê piştgiriyê bidin girtiyan. Pêngav hem bi belavkirina karên îdeolojîk, teorîk û felsefîk ên Rêber Apo, hem jî bi çalakiyan dewam kir. Yek ji vê plansaziyê jî ew bû ku di salvegera 15’ê Sibatê de 100 hezar kartpostal ji girava Îmraliyê re bêne şandin. Plansaziyeke din a girîng jî di 17’ê Sibatê de bi beşdariya ji hemû welatên Ewropayê li bajarê Koln ê Elmanyayê komploya navneteweyî bê şermezarkirin şopdarên fikir û paradîgmaya Rêber Apo, bi biryar bûn ku sala 2024’an ji bo azadiya Rêber Apo û çareseriya pirsgirêka Kurd bikin saleke pêngavê.



# 26 sal in Rêber Apo li hember hêzên komploger têkoşîn dike

Di 9’ê Cotmeha 1998’an de komployeke navneteweyî li dijî Rêber Apo dest pê kir. Ev komplo di şexsê Rêber Apo de li dijî kurdan, Kurdistanê û Rojhilata Navîn bû. Bi vê komployê xwedayên bêrehim û zordest, xwestin heqîqetê di bazarên xwe yên bêhinpêketî de pêşkêşî berjewendiyên serweran bikin.

**Amara Baran/ Qamişlo**

Bi destpêkirina Komploya Navnetewî ya 9’ê Cotmehê de xwedayên bê rihim û zordest, xwastin heqîqeta me di bazarên xwe yên bêhn peketî de pêşkeşî berjewendiyê serweran bikin. Lê zarokên rojê agir, wek zîlanan ber bi meydana tekoşînê ve herikîn û jiyana azad tacîdarkirin. Pêlên behrê jî nekarîn vî agirê di nava dil û mêjiyê lerzok de vemrîne lewma ev agir agirê deyindariyê ye, ev agir agirê tekoşînê ye divê ney vemirandin.

### Roja ku bêbextî gihaştiye asta herê jor

Li hember vî bêbextî û komplogeriyê vemirandina vî agirê ku di bedenê serhildêr de pêketiye îxanete, nuqut nuqut ji bedenên ciwan herikîn nava pêtên bi heybet, dîsa em tên heman meh û heman rojê, di vî roja ku bêbextî gihîştiye asta herê jor de av, ax, dar û hemû xwşiktiya xwezayê ji şerma xwe bi rengê reş xwe dorpêç dikin.

Wijdan weke gureke har dil û mêjî dorpeç dike. 26 sal, 26 salvegerên bi êş û tarî çi bi jane çar dûwar gelo pêkane ku çar bend bikarin dîroka mirovahiyê ya gelekî zindî dorpêç bikin. Helbet wan xwadayên ku pergala girevê avakirine ev armanc kiribûn,lê bê guman bi ser neketin gello dûbareya dîrokê gengaze, ango gerdun, zindî, hebûn û mirovahî wekê çarenûsekî tene xwe dubarekirinê de jiyan dike.

### Plankirina komployê xizmetkirina berjewendî û siyaseta hêzên cîhanî bûn

26 sal bi ser komploya navnetewî ya 9’ê Cotmehê re derbas dibin. Hêzên komploger bi tunekirina Rêber Apo û tevgera azadiyê dixwestin qirkirina Kurdan bibin serî. Lê Gelê Kurd û Tevgera Azadiyê ya Kurdistanê bi pêşengiya Rêber Apo 26 sal in li dijî hêzên komploger têkoşîn û berxwedaneke dîrokî dikin. Rêber Apo û Tevgera Azadiyê bi serketin lê Hêzên Komploger yek bi yek li pey hev têkçûn.

komplo di 9 ê Cotmeha 1998 de destpê kir, armanca wê tasfiyekirina têkoşîna rizgariya netewî ya bi pêşengtiya Rêber Abdullah Ocalan bû, Ji ber vê yekê mirov nikare bi awayekî seranser li buyer û encamên vê komployê binêre, tê zanîn ku plankirina komployekê bi vî rengî li ser esasê xizmetkirina berjewendî û siyaseta çend hêz û aliyên cîhanî û herêmî bû.




### Armaca komployê tunekirina tevger û gerîla bû

Di 9 cotmehê de Bi êrîşa li ser Rêber Abdullah Ocelan hêvî kirin ku bi ser bikevin, plana vê danîn, stratejiya xwe li gorî vê guhartin û Komploya 9’ê Cotmeha 1998’an bi vê bingehê anîn rojê. Di hemû êrîşên berê de tevger û gel dikirin hedef xwe. Pêşî êrîşa wan li ser tevgerê û gerîla bû, bi çewisandina tevger û gerîla, bi belawelakirina wan dixwestin ku encamê bigirin. Dema ku dîtin ev stratejî bi ser neket, vê carê stratejî guhartin. Îmhakirina Rêber Abdullah Ocelan kirin navenda êrîşên xwe, bi vê bingehê armanc kirin ku PKK’ê tasfiye bikin, gerîla bêkêr bikin û astengiyên li pêş qirkirina Kurdan rakin. Bi vî rengî komplo derkete holê.

### PDK’ê di kompolya 9 cotmehê de roleke bingehîn leyîst

Di vê komploya navneteweyî ya li dijî Rêber Apo, PKK’ê û gelê Kurdistanê yê welatparêz hatî kirin de, hêzên xiyanetkar û hevkar jî xwe diyar kirin. Hîn rasttir rolê xwe bi ti rengî înkar nekirin. Çawa ku di sala 1992’yan de Dewleta Tirk û PDK’ê hêzên cuda yên Kurd girtin gel xwe û xwestin bigihijin encamê, di Komploya 9’ê Cotmehê de jî heman aktoran cihê xwe girtin. Peymana Washîngton a di 17’ê Îlona 1998’an de pêk hatî jî, bûye nîşaneya vê ya herî şênber. Di pêvajoya piştre de ev êrîş bi rengekî daîmî dewam kirin.

PDK’ê ne ji roja me ya îro de ji dîrokê heta niha îxaneta xwe de bi israre,di komployê de jî rola PDK pir girînge û bi hêzên hegemon re dinav plangeriya qirêj de cîh digre. DYE û hêzên wiha dixwazin xwe bispêrin ser PDK’ê. Tê fêhmkirin ku di nav AKP’ê de jî hin derdor qanih kirine. Aşkere neyê gotin jî dixwazin Kurdatiyeke xayin, noker ku xwe dispêre ser PDK’ê bihêlin û hebûna Kurdan, Kurdistanê tine bikin, tasfiye bikin û qir bikin.

### PDK’ê mohra xwe danîn bin protokolê

Di 17’ê Îlonê de li paytexta DYE Washîngtonê, bûyereke din a krîtîk wê biqewimiya. Ji bo lihevkirina PDK û YNK’ê ku bi salan şerê hev dikirin, hevdîtinên li Dûblîn û Enqereyê ku Tikriye û Îngilistan jî di nav de bûn, wê êdî bi malovaniya Washîngtonê bihatina kirin. Rêveberiya wê demê ya DYE’yê protokolek amade kir û PDK’ê mohra xwe danîn. Yek ji xalên bingehîn ên di wê peymanê de li ser li hev kirin ew bû ku hêzên PKK’ê ji Başûrê Kurdistanê bên derxistin. Bi van her du bûyeran re ev peyam didan Abdullah Ocalan û gerîlayên Kurd; “Hûn êdî nikarin li cihekî bimînin.” Bi vî rengî ji bo Kompolya Navneteweyî ya ku wê 9’ê Cotmehê dest pê bikira, êdî şert û mercên hundirîn û derve hatibûn amadekirin

### Ji 9’ê Cotmehê heta 15’ê Cotmehê agahî ji Rêber Abdullah Ocelan nehat girtin

Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan bi rêya hewayî ji Şamê derket û bi qasî hefteyekê tu agahî jê nehate stendin. Rêber Abdullah Ocalan di 15’ê Cotmehê de bi telefonî tevlî MED TV bû. Di destpêka axaftina xwe de gotibû ku, “Beriya her tiştî ji bo gelê me, hemû welatên Misilman û mirovayetiye pêşverû, di şexsê me de li ser gelên Rojhilata Navîn komplo hatibû ferzkirin. Ev komplo a niha nîvî ma û bi ser neket.”

Rêber Abdullah Ocalan wê piştre diyar bikira ku çima ne rojeke din lê di 9’ê Cotmehê de MED TV hate reşkirin û wê bal bikişanda ser vî tiştî ku ev parçeyekî plana giştî ye û armanca wê çi ye.

Rêberê Gelê Kurd bi komploya 9’ê Cotmehê re têkilî bi komploya li dijî Tevgera Azadiyê ya Kurdan a ku piştî di sala 1986’an de dema ku Serokwezîrê Swêdê Olof Palme hatibû kuştin re datanî û ev tespît dikir, “Vê cînayeta ku bi qestî hatibû kirin û piştre jî reşkirina hemû Kurdan, karê Gladyoyê bû. Mesela gotin ‘Ferman ji Apo hatiye’ Min gelekî dixwest bizanibim ferman ji ku hatiye. Wekî ku van rojan wê demê jî rojnameya Hurriyetê ev manşet dabû ‘Em ê sibê vê fermanê eşkere bikin’ lê nehate eşkerekirin. Heke bihata eşkerekirin wê maske biketa û rûyê navxweyî yê komployê bihata fêmkirin. Ez ê ji temaşevanên hêja, gel, rojnameger û ronakbîran bixwazin ku bila bi baldarî bûyera Palme bidin ber hev. Heman komplo a niha li ser me jî tê kirin. Tasfiyekirina Palme bi rastî jî girîng e û hê jî nehatiye zelalkirin, bi qestî nayê zelalkirin.

### Reber Apo: Di 9 Cotmehê de min bêhna komployê girt

Di 9’ê Cotmehê de wê bomberdûman were kirin. Ji bo ku pêk were jî cih û saet hewce ye. Ka bala xwe bidin telaşa wê rojê. Mesût Yilmaz got, ‘Qediya, ev hişyariya dawîn bû’. Biryara şer heye, her kes bi vê dizane. Li meclîsê jî bi yekdengî biryar û raye stendin. Lê bi tesadufî ji bo diyarkirina cih û saeta ku em ê lê bin, li gorî min di sê rojên dawîn de karek hebû divê bikirina. Ev tişt hewceyî zelalkirinê ye. Bi rastî jî me ji hin dostên xwe re gotibû ku, di wê saetê de em ê li ku bin. Lê ez ê nikaribim bibêjim ez gumanan dibim ser wan lê em ê lê bikolin, di wê saetê de divê sozek bianiyana cih. Ew soz jî neanîn cih û gotin, ‘Di filan saetê de divê tu wisa tevbigerî ku divê encama wê wisa be’. Min ev tişt qebûl nekir. Min got, ‘Hûn çima dibêjin bila di vê saetê de bila ev tişt pêk were? Di vir de bêhna komployê heye’ û min qebûl nekir. Vê rewşê rê li ber nîqaşeke mezin a du saetan vekir. Ji sedî sed bendewariyeke wisa tunebû. Ev tişt jî Îna par pêk tê. Di nîqaşeke wisa de em şaş man. Me got ‘Nexwe hûn lîstikekê dilîzin’. Hûn çima saeteke wisa bi israr li ser me ferz dikin? Bi ser de tişta berevajî wê ferz dikin. Him saet him jî ya berevajî wê. Ev ji bo me teqez komployek e. Di nav vê nîqaşê de ya ku me digot em qebûl nakin, me jî cihê xwe, wexta li gorî cih ne li gorî ku ew fêm dikin û li bendê bûn, bi awayekî din pêk anî. Ev şansek bû, tesadufek bû yan jî tercîhek bû.

Wê saeta ku ew ê bi fuzeyan lê bidana wekî wan derneket û cih jî ne ew cih bû ku ew li bendê bin. Wan du cih hilbijartibûn, dema ku ev her du cih nebûn cihên ku em ê biçinê, plana wan nemeşiya. Ez dikarim bi eşkere vî tiştî bibêjim, heke ew saet li gorî ya wan bûye, wê li Rojhilata Navîn şerekî nû yê herêmî bihata destpêkirin. Wekî pirtûka Glancy a ‘Çalakiyên rê li ber şer vedikin’ cihê ku em lê bûn –Wan digot qey Sûriye ye- wê ew der bomberdûman bikirina. Ji bo bomberdûmankirina hedefên ekonomîk, wan di rojnameyan de gelek krokî xêz kiribûn. Dibêjim qey wê li gorî van krokiyan hemû hedefên ekonomîk ên Sûriyeyê û Seraya Serokwezîriyê bihata bomberdûmankirin. Operasyoneke nîvco, wan şûrê xwe hildane, wê nexwezin ku şûrê xwe deynin.”

### Bultena Sor’ ya 9’ê cotmehê amade kirin

Hêzên ku di 9’ê Cotmehê de komplo amade kiribûn, hesabê derketina ji Sûriyeyê jî kiribûn û ji bo Rêberê Gelê Kurd bi koda ‘lezgîn’ di Bultena Sor a Înterpolê de biryara girtinê dabûn. Ji roja destpêkirina komployê bi qasî 10 roj şûnde di 19’ê Cotmeha 1998’an de Abdullah Ocalan bi rêya telefonê tevlî MED TV bûbû û digot, “Çima di 9’ê Cotmehê de bultena sor hate derxistin? Çima ne rojeke din lê îro? Ji bo komploya navneteweyî ev îspateke gelekî mezin e. Li her derê belav kirine, ‘Heke ev kes têkeve kîjan welatî, wî zeft bikin’ Agahiyek lê zêde kirine, ‘Dibe ku di derketina Sûriyeyê de jî dibe’ Di van wextan de hin îstîkametên me hene. Heke biçe van deran wê were bomberdûmankirin heke biçe wê derê ew der qadên Înterpolê ne. Bûyera ku ez jê re dibêjim ji sedî 99 rêya derketina ji nav wê tune, ev e.

Ji Behra Spî heta sînorên Sûriyeyê fuze hatine bicihkirin. Deh hezar leşker li Zaxo bi cih kirine. Xayînên PDK’ê li Garê dest bi êrîşê kirine. Tevdîreke wisa kirine, ev hemû belge ne. Di qada navneteweyî de bulteneke sor derxistine, qaşo em biçin kîjan welatî wê li wê derê me bigirin. Baş e, em ê herin ku dera dinyayê? Ji bo rizgarbûna ji wan divê mirov biçe fezayê yan jî heyvê. Tarzeke wisa ya giran a komployê heye, mirov nikare jê rizgar bibe.

# Aldar Xelîl: Tu Kes Nikare Roja Me Tarî Bike


Endamê Desteya Hevserokatiya PYD'ê Aldar Xelîl da diyar kirin ku Komploya Navnetewî ya 9'ê Cotmehê domandina qirkirina gelê herêmê ye û got, "Dîlgirtina Rêber Apo dîlgirtina hemû mirovahiyê ye."

**Argêş Gewda/Qamişlo**

Derheqê Komploya Navnetewî ya 9'ê Cotmehê û bandora wê li ser gelê Kurd û tevahiya gelên herêmê, endamê Desteya Hevserokatiya PYD'ê (Partiya Yekitîyên Demokrat) Aldar Xelîl pirsên rojnameya me bersivand û heypeyvîn wiha bu:

**1- Armanca Komploya Navnetewî ya li ser Rêber Apo hatiye meşandin çi ye û hêzên ku li pişt wê komployê cih digirtin kê bûn?**

Tê zanîn, 9'ê Cotmeha 1998'an li hemberî Rêber Apo Komployek Navnetewî hate destpêkirin. Ev komplo ne tenê li dijî Rêber Apo hat kirin, di heman demê de, di kesayetê Rêber Apo de li dijî Gelê Kurd hat kirin. Rêber Apo bi şêwazeke ku destê tarî di nav de birin paytexta Yûnanistan yê Atînayê. Ev bû berdewamiya pêvajoya dilgirtina Rêber Apo ya 15'ê Sibatê jî. Piştî wê Rêber Apo radestî dewleta Tirk a dagirker hat kirin. Serokwezîrê wê demê yê Dewleta Tirk a dagirker Bûlent Ecevît anî ser ziman û got 'Me nezanî ev bûyer çawa pêk hat?' Ev hurgûlî me dide xuya kirin, gelek hêzên hegemon yên veşartî destê wan di nav komployê de heye. Dewleta Tirk tenê rîsta gardîyan di leyize. Bi wê pêvajoyê hêzên desthilatdar û tarî hewildan kirin ku di kesayetê Rêber Apo de, gelê Kurd giştî dîl bigirin. Rêber Apo hemberî wê komployê sinorek xêz kir. Bi wê komployê nekarîn Rêber Apo bê deng bikin. Ramanên Rêber Apo di Îmraliyê de gehişte mejiyê milyonan mirova. Ev 26 salin di destê dewleta Tirk ya dagirker de dîl girtiye. Gelê Kurd piştî wê pêvajoya komployê bi şîara 'Hûn Nikarin Rojame Tarî Bikin', li derdorê Rêber Apo bû xeleka agir. Gelek ciwan, keç û xortên kurd agir berdan bedena xwe. Rêber Apo ne tenê weke Rêbere, ew weke wîn û hişmendiya xwe didîtin. Di dîroka Tevgera Azadiyê ya Kurdistanê de gelek xweşmêr û fedayî derketin. Komploya Navnetewî bû sedem ku ev bigihije lûtkeyeke din. Berovajî wê, Rêber Apo bi felsefeya xwe zêdetir gelê Kurd ê ku razayî bû şîyar kir. Armancgirtina Rêber Apo, ji ber ku wî dara ziwa bû şîn kir û ji tinebunê hebûn avakir. Destpêka damezirandina Tevgera Azadiyê navê Kurd û Kurdistanê jî ne dihat zimanê ti kesî. Tevger û rêxistinên beriya Tevgera Azadiyê, şûna pirsgrêka Kurd çareser bikin, berovajî wê pirsgrêk kûrtir dikirin. Di hat zanîn ku êdî zayînek û hişmendiyek cûda ji bona civakê pêwîste. Ev pêwîst bû ku civaka kurd êdî hilbijartinekê bike. Rêber Apo bi avakirina Tevgera Azadiyê û belavkirina hişmendî û ramanên xwe derbeyek mezin li pergala heyî xist. Ev hêzên tarî û hegemon hewildan kirin ku Rêber Apo fizîkî tine bikin. Di sala 1996'an de, li paytexta Sûriyê Şamê, nêzî cihê Rêber Apo tê de dimîne teqînek mezin rû da. Heman dîrokê de hemberî wê çalakiya Şehîd Zîlan a meha Pûşber a 1996'an bi çalakiya xwe ya fedaî ev vala derxist.



**2- Rêber Apo çawa hişt ku Komploya Navnetewî negihêje armanca xwe?**

Piştî salên 2000'î, Rêber Apo dest bi nivîsandina Paraznameyan kir. Bi rêbazeke têr tijî Rêber Apo bi ramanên xwe gelê Kurd û Rojhilata Navîn agahdar kirin û civak perwerde kir. Niha ev salên dawiyê de, li ser Rêber Apo tecrîd û izalasyonek mezin hatiye destpêkirin. Ji ber bikarin ramanên Rêber Apo yî ku cîhanê bandor dike belav nebe. Dixwazin hişmendîyê mirovan pêşnekevin. Rêber Apo pêşengê çareserkirina alozîyên Rojhilata Navîn e. Ger pêşengên şoreşa Rojavayê Kurdistanê gor fikir û ramanên Rêber Apo bingeh ne girtiban, dê deskeftiyên Kurdan hemû têk çû ba. Rêber Apo bi nivîsandinên Paraznameyan nerîn û felsefeyan xwe komplo pûç kir. Ev bû sedem ku cîhan hemû bi ramanên Rêber Apo sûd werbigire. Ji ber Rêber Apo got ' Paraznameyên min li ku bin ez li wirim.' Rêber Apo bi sekna xwe ya berxweder komplo jî, tecrîd jî wala derxist. Tecrida girankîrî ya ku li ser Rêber Apo dimeşe, berdewamîya komployê ye. Şoreşa Rojavayê Kurdistanê jî ramanên Rêber Apo serkeft. Gel û peşêngên ji Rojavayê Kurdistanê perwerde kirin û ev kirin xwedî zanist. Ev şoreşa pêk nehatiba, dê hêzên veşartî li ser axa Bakur û Rojhilatê Sûriyê deshilatî daban meşandin. Piştî destpêkirina şoreşa Rojava û Bakur Rojhilatê Sûriyê ji bona şoreş sernekeve tecrîdek girankirî li ser Rêber Apo dihate destpêkirin.

**3- Di 10'ê Cotmeha 2023'an de pêngava cîhanî ya bi navê "Ji Rêber Apo re azadiya fizîkî, pirsgrêka Kurd re çareserî" hatiye destpêkirin. Ji bona serkeftina wê pêngavê dibe çi were kirin, erkê dikeve li ser mile civakê çi ye? Peyamek dawîyê li ser Kompoloya 9'ê Cotmehê heye?**

Di destpeka damezêrandina da Tevgera Azadiyê de, gelên din Rêber Apo zêde nas nedikirin. Piştî xwendinên paraznameyên Rêber Apo ji nûve Rêber Apo fêm kirin û wek Rêberê xwe dîtin. Jina bi eslê xwe Yûnanî Elefterîa Fortulakî piştî pêwajoya dîlgirtina Rêber Apo çalakiya fedaîyane pêş xist.



Ruxmê ku wê hevalê Rêber Apo ne dîtibu jî da xuyakirin, ji bona miro Rêber Apo re jiyan bike ne pêwîste mirov tenê Rêber Apo bibîne. Li ser wê bingehê ji bona azadiya Rêber Apo gelek cûre çalakî pêş xistin. Bakur, Başûr Rojhilat û Rojava herderê di nav tevgerek mezin da bûn. Temenê 7 heya 70'ê salî Rêber Apo re xwedî derketin. Ev da xuyakirin ku raman û felsefeya Rêber Apo civakî ye û giştî mirovahîyê digire bin sîwana xwe.

Bangawazî ya me ji bona gelên bindest û bin desthilatiya hêzên metînger de berxwe didin e. Ev hêzên ku rista xwe li wê komployê de hebûn em şermezar dikin. Pêwîste ev jî li derdorê ramanên Rêber Apo re kom bibin. Rêber Apo Rêberekê netewî ye û raman û birdozîya wî ji bona hemû gelên bindestin. Saziyên navnetewî yên weke CPT û DMME ( Dadgeha Mafê Mirovan yê Ewropa) dibe erkên xwe rabin. Dema Rêber Apo dibe mijar cîhan hemû bê deng e. Biryara DMME, ruxmê ku derheqê Rêber Apo dibe demildest bê berdan jî heye, dewleta Tirk ya dagirker zagonên navnetewî binpê dike. Ev sazî û dezgeh ji hemberî kiryarên dewleta Tirk ya dagirker bê helwest û bê dengin. Ji ber berjewendîyên wan yên desthilatî û metingerîyê rê nade, helwestek aliyê berjewendîyên gel danin holê. Bangawaziya ji bona rewşa Rêber Apo, bangewaziya gelên Rojhilata Navîn e. Pewîste saziyên navnetewî bi erkên xwe rabin, zagonên xwe binpê nekin. Ji ber azadiya Rêber Apo, azadiya hemû gelên bindest e. Ji bona azadiya Rêber Apo ya fizîkî ti erk bikeve ser milê kê dibe erka xwe rabe. Dîsa em bi wê mebesta rojên reş û tarî destpêkirina Komploya navnetewî a 9'ê Cotmeha 1998'an şermezar dikin û şehid û pakrewanên derdorê Rêber Apo bûn xelekek agir bi dirûşmeya ' Hûn Nikarin Roja me Tarî Bikin', bi rêzdarî bibîrtînin û soza bilindkirina agirê rojê didin.

## Alozî kûr e û tekane rêya çareseriyê Xweseriya Demokratîk e



**Dilyar Cizîrî**

Kirîza li Rojhilata Navîn daye der her ku diçe dijwartir dibe. Îsraîl bê navber biryar daye bi hêza leşkerî û piştevaniya DYA û Ewropa hegemboniya xwe li ser gelên herêmê feriz bike. Li dijî dijberên xwe Tevgera Hemas û Huzib El-Ah ên piştgiriya xwe ji Îranê digirin, cek û teknîka xwe bikar tîne. Gefa destwerdana leşkerî li dijî Lubnanê dide û gefa êrişa li dijî Îranê dixwe. Wiha lê hatiye ku her kes êdî bi tirsa ku şerê di navbera wan ê di çarçoveya şerê cîhanê yê sêyemîn de pêk tê, veguhere şerê çekên nuklerî û zirar li xweza û mirovahiya di herêmê de were.
Lê tişta ji helwesta hêzên mezin ên wekî DYA, Ewropa û Neteweyên Yekbûyî diyar dibe, di vê qonaxê de wê ev yek pêk neyê. Wer xuya dike armanca sereke ya Israîl formatkirina rayedarên Hemas û Hizib El-Ah e. Di heman demê de peyamdayîna ji Îranê re ye. Di heman demê de li dijî rêjîma Beşar El-Esed dike armanc û li cihê dixwaze fûzayên xwe bi ser de dibarînin. Rêjîma Esed jî di bê xemiya xwe de berdewame. Armanca wî ya sereke desthiladariya wî parastî bimîne.
Tişta herî zêde di alozî û şerê di navbera wan de mirovan dêşîne kuştina sivîlan e. Di şerê Xeza û Lubnanê de heta niha bi hezaran kesên bê guneh ku hejmarek mezin zarok jî di nav de jiyana xwe ji dest dane. Gelekê din jî birîndar bûne. Pirsgirêka mezin hemû hêzên di nava şer û bazaran de cih digrin bi tu awayî xema wan ji qurbaniyên civakê tune ye. Derdê wan parastina desthiladariya xwe ye. Dema mirov nûçeyan li ser malper û kenalên desthiladaran dişopîne baş diyar dibe, hêzên behsa mijarê çi Israîl û hevkarên wê eniya Rojava, çi Îran û hevkarên wê eniya Rojhilat bi heman zihniyetê ji bo parastina desthildariya xwe tenê şer dikin. Yên dibin qurbanî û zirarê dibînin jî civak e.
Heger rast ew hêz bixwazin şer rawerste û aloziya di navbera Îsraîl, Hizb El-Ah û Hemas jî li Rojhilata Navîn bi dawî bibe, gerek li mînakên çareseriyê bigerin. Ev mînak ne zêde dûre. Di aloziya Sûriyê ku ev 14 sal in her ku diçe gûr dibe, tevî destwerdanek navdewletî ya bê dawî di xaka Sûriyê de çêbûye. Destdirjiya dewletên herêmî wekî Tirkiyê û Îranê heye. Li Bakur û Rojhilatê Sûriyê sîstema Rêveberiya Xweser bi rêk û pêk parastina xwe kiriye, Piratîka Rêveberiya Xweser û hevgirtina netew û mezheban a li ser esasê piradîgma Netewa Demokratîk pêk hatiye, xetên çareseriyê nîşan daye. Xeta xwe dispêre hevgirtina civakê û rakirina berpirsyariya rêveberiya xwe ye. Ji bo wê gerek hêzên niha di nava şer dene, di heman demê de hêzên din ku bi sedên salan tu aliyekî nikariya aliyên din tune bike. Wekî mînak ma Israîl dikare Hemas û Huzib El-Ah tune bike. Yan dewletên din dikarin tevgerên siyasî û leşkerî tune bikin. Bê guman bersiv na ye.
Ji ber wê baş isbat bûye Ezmûna Rêveberiyê û hevgirtina civakî ya demokratîk tekane riya çareseriyê ye.



# Li dijî pergala îşkence û qirkirinê pêngava cîhanî didome

Pêngava Cîhanî ya azadiya Rêber Apo saleke tijî xebat li dû xwe hişt. Hevserokê KCDK-E Engîn Sever diyar kir ku di nav salekê de di hemû qadên ku wan xwe têde birêxistin kiribû, perspektîfa hemlê kir bingeh û li gor wê xebatên dîplomasî û çalakiyên heyî gihandin armancên wan.

**Navenda Nûçeyan**

Pêngava cîhanî "Ji Abdullah Ocalan re azadî, ji pirsgirêka kurd re çaraseriya siyasî" salek tijî çalakî û xebatên cur be cur li pişt xwe hîşt. Divî çarçoveyê de Hevserokê KCDK-E Engîn Sever ji rojnameya me re axivî.

**'Li 83 welatan çalakiyên hemdemî hatin destpêkirin'**

Engîn Sever di destpêka axaftina xwe de wiha got: " Pêngava "Ji Abdullah Ocalan re azadî, ji pirsgirêka kurd re çaraseriya siyasî" ku di qada navnetewî de di pêşengtiya dostan de di 10 Cotmeha 2023'an de hatibû destpêkirin ket pêvajoyeke tekoşînê, li 83 welatan çalakî bi hemdemî hatin destpêkirin û pêngav bi coş û kelaceneke mezin hat domandin. Di heman wextê de me wek KCDK-E li Strasbûrgê jî bi çalakiya rûniştinê starta hemlê da. Di nav hemû kar û xebatên ku hatin meşandin de xebatek bi çalak derket holê. Di nav salê de di hemû qadên ku me xwe tê de birixtin kiribû perspektîfa hemlê kir bingeh û li gor wê xebatên dîplomasî û çalakiyên heyî hemû di nav hev de meşand û heta astekî bi encam bû."

**'Armanca Pêngavê azadiya fîzîkî a Rêber Apo ye'**

Engîn wiha domand: "Pêngava ku ji bo azadiya fîzîkî a Rêber Apo hatibû destpêkirin. Saleke xwe dagirt, armanca destpêkirina vê pêngavê rakirina sîstema işkenciyê û qirkirinê li Îmraliyê.



Li hemberî sîstema îşkencê a ku bê navber didome gelê kurd û dostên wî asta berxwedana xwe bilind kirin. Armanca hemlê azadiya fîzîkî a Rêber Apo ye. Ji destpêka pêngavê ve û heta roja me ya îro gelek çalakî yên wekî ; (xwendina Rêbertî, hevpeyvîn, semîner, konferans, xebatên siyasî, hiqûqî û têkiliyên derve hatin meşandin.

**'Di nav salê de çalakiyên cur be cur hatin meşandin'**

Engîn dewam kir: "Di çarçoveya pêngavê de me di nava salê de bi çalakiyên berfireh û curbecur hewl da ku pêvajo bişopînin. Şandina kartpostalan ji Rêbertiyê re, bi taybetî konferans û meşa Lozanê, 14 Tîrmeh, 15 Tebaxê de li Frankfurtê festîvala kurt a hûnerî, meşa Dusseldorf ê, meşa ji bo qetlîama parîsî, 17 Sibatê meş û mitnga Koln ê. Meşa dirêj a enternasyonela û Gemlîkê, meşa dirêj a ku 25 rojan li parîsê destpêkir û li Strasburgê bi dawî bû, 8 Adarê, Newroz,, festîval û pîrozbahiyên 4 Nîsanê û gelek çalakiyên cur be cur hatin li darxistin. 10'ê Kanûnê Xwendina ji Roja Rêbertiyê ku li ser asta cîhanê hate meşandin, bi tevlîbûneke cidî hat meşandin. Konferansa navneteweyî ya tevgera ciwanên Kurd ên Ewropayê li Parîsê û nêzîkatî û peyamên tevgera navneteweyî ya giştî ya ji bo pêngavê di konferansa Swîsreyê de bi awayekî erênî li îradeya beşdarbûna pêngavê di qada navneteweyî ya cîhanê de derket holê"

**' Li gor taybetmendiyê pêkhateya xebat hat meşandin'**

Engin wiha got: "Qonaxa yekemîn a pêngavê bi meşa 17'ê Sibatê ya Kolnê bi dawî bû û qonaxa duyemîn dest pê kir, meşa Kolnê nîşan da ku şêwazê ku yek bi yek diçe gel û bi xebata li ser hemû pêkhateyan li gorî taybetmendiya wan çalakiya kolektîf pêş dixe, serkeftinê bi xwe re tîne û hem tevlîbûn hem jî vîna gel xurt dike.

Di 1'ê Adarê de bi daxuyaniya çapemeniyê ya komîteya çalakiyê dest bi kampanyayê kir. Çalakî û çalakiyên ku di destpêka meha Adarê de dest pê kirin, ne li qadên ku bi girseyî Newroz hatin pîrozkirin, " bi dirûşma Azadî ji Rêber Apo re", bi sed hezaran gelê kurd bi ruhê yekîtiya neteweyî Newroz pîroz kirin, bi taybetî li Elmanya, Marsîlya. Li Swêd, Swîsre, Îngilîstan, Kanada û Awûstûryayê kartpostalên ku li Îmraliyê û CPT hatin şandin, li hemû qadan bi berfirehî hatin kirin. Tevlîbûna xurt a gelê me ya 32. Festîvala Çanda Kurd, çalakiya sereke ya qonaxa 2.mîn bû. Paradîgmaya Rêber Apo di serî de li ser gelên Amerîkaya Latîn, Afrîka, Kanada, Awûstralya û Ewropayê bi bandoreke mezin berdewam dike. Li ser vê bingehê tevgera azadiyê her roj bi daxuyaniyên nû bûye global. Li ser vê bingehê, daxuyaniya 80 kesayetên ku xelata Nobelê girtibûn, Daxuyaniyên 1500 parêzeran, û çalakiyên cihêreng ên li herêman pêk tên, hemû bûyerên girîng û erênî ne ku bi hewldaneke mezin pêk hatine."

**Pêngav her û her bidome**

Engîn wiha behsa xebatên deme pêş kir û got" Di meş û mîtînga ku Kurdistanî û dostên wan ên li navenda Ewropa, Elmanya, Bakurê Fransa, Swîsre, Belçîka û Hollandayê dijîn de, wê komploya navneteweyî şermezar bikin û daxwaza azadiya Rêber Apo bikin. Ji bo ku hemû gel û dostên me bi awayekî aktîf beşdarî vê meşê bibin, divê hemû xebatkarên me bi taybet meclîs, komîte û pêkhateyên me bi ruhê seferberiyê bixebitin. Ji niha û pê ve jî plansaziya çalakî û çalakiya me ya ku dê Qonaxa 2'mîn bigihîne jor dê bi berfirehî berdewam bike. Bi armanca tekoşîna li dijî komploya navneteweyî di navbera 1 û 11'ê Cotmehê de li ser asta cîhanê çalakiyan pêk werin. Ji bo vê jî wê li sedan navendan bi beşdariya dost û gelê me çalakîyên bi bandor bên lidarxistin. Meşa dirêj a ciwanan wê di meha Cotmehê de dest pê bike û 25 rojan dewam bike. Di salvegera komploya 12'ê Cotmehê de wê li welat û dewletan çalakiyên protestoyî bên lidarxistin. Di 16'ê Mijdarê de wê fînala meşa azadiya Rêber APO li bajarê Koln ê Elmanyayê bê lidarxistin."

## Bi Komploya 9'ê Cotmehê serdema Şerê Cîhanî yê 3'emîn hat amadekirin



**Zekî Bedran**

9'ê Cotmeha 1998'an de, Rêber Apo ji Sûriyê hat derxistin. Bi Komployeke Navnetewî, destûr nedan Rêber Apo li Ewrûpa û Rûsya bimîne. Encama wê komployê Rêber Apo radestî dewleta Tirk ya dagirker hate kirin. Pêşeng û rêxistinkirina wê komployê DYA bû. PKK'ê li dijî DYA ti rewşên çalakî û şeran de cih negirtiye. Rûxmê wê DYA Rêber Apo kir armanc, tevlîkirina hêzên navnetewî û bi hêza xwe ya hûndirîn zagonên Ewrûpa binpê kir û bû alîgirê hêzên komployê. Wê demê gelek hêzan wate neda wê rewşa DYA. Çima DYA ev qas bi israr e? Ji ber wê yekê sîyasetmedarê Tirkiyê yê herî pispor Bûlent Ecevît jî got "DYA Apo çima radestî me kir, hin jî me nas nekiriye"
Em niha dikevin sersala 26'emîn ya Komploya Navnetewî. Rêber Apo hîn li Îmraliyê ye, hîn dijî wî, gelê wî û tevgera wî komplo didome. Li Îmraliyê mafên Rêber Apo yê mirovî û zagonî hatiye ji destgirtin û jîyan û tendurûstiya Rêber Apo di bin metirsîyek giran deye. Lê ruxmê wan kiryarên dij qanûnî NY û saziyên eleqedar di nava bêdengiyek mezin dene. Ti kes navê Rêber Apo nayîne ser ziman û ji berpirsyartîyê direvin. Ev kiryarên ku diqewimin ne karê sazûmaniya dewleta Tirk ya dagirker tene ye. Tê xûya kirin, piştgiriya DYA û Ewrûpa jî heye.
Rewşa Rojhilata Nawîn ya îro, kiryarên wê demê baş dide fêm kirin. Rêber Apo dema dahûrandina Komploya Navnetewî dike, dibêjê "Armanca wan ji nû ve dizaynkirina Rojhilata Navîn e, cîhan dikeve pêvajoyek nû." Rêber Apo tîne ser ziman ku Şerê Cîhanê yê 3'emîn destpêkir. Roja me ya îro, gelek aliyên bîyanî nirxandinên weke Şerê Cîhanê yê 3'emîn destpêkir, destpê dike dikin. DYA û hevalbendên wê BOP (Projeya Rojhilata Navîn ya Mezin) dan pêşiya xwe. Piştî têkçûyina Sovyetan hewil didan valatiya ku heyi dagirin û cîhanê ji nûda sererast bikin. Ev jî li Rojhilata Navîn destpêkirin.
Kurd li Rojhilata Navîn gelekê kevnar û xwedî hejmareke mezine. Lê dewleta wan tune bû. Bi pêşengiya Rêber Apo berxwedan, birêxistinkirin û hişmendiya xwe mezin kirin. Di şerê Kendavê de herî zêde PKK'ê sûd wergirt. Rêber Apo rêbertiya afirîner û bi hêz kir. Vê taybetmendiya wî bala CIA, DYA û NATO kişand. Ji bo PKK'ê li Rojhilata Navîn nebe asteng serlêdan li Rêber Apo kirin. Difikirîn ku bêyî wî PKK'ê û gelê Kurd wê nikaribin şer bikin û bi bandor bin. Ji bo şikandina berxwedana gelê Kurd û avakirina herêmê bê astengî, li dijî Rêber Apo dest bi şer, operasyonek mezin kirin. Niha Tirkiyê bi hemû hêza xwe êrîş dike da ku PKK'ê biqedîne û gelê Kurd ji dîrokê de rake. Dixwaze weke berê bi yekkirina Îran, Iraq û Sûriyê li dijî Kurdan jî dorpêçê temam bike. Bi kurtasî hewl dide xefika kurdî ya klasîk deyne. Tirkiye di vî warî de rastî gelek astengiyan nayê. Ji ber ku van dewletan polîtîkayên xwe neguherandin û demokratîk nebûn. Ew hê jî avahiya netew-dewleta navendî diparêzin. Ji bilî Iraqê hinekên din dev ji polîtîkayên xwe yên asîmîlasyon û înkarê yên li ser kurdan bernedan.
Israîl di komploya 9'ê Cotmehê û dewama wê de roleke pir çalak û bi bandor lîst. Niha jî hewl dide bi kişandina Îranê di nava şer de, di dîzaynkirina Rojhilata Navîn de ji bo DYA û Ewropayê tiştan hêsantir bike. DYE ji parastina endamekî NATOyê zêdetir bi parastina Îsraîlê mijûl e. Wî ji bo parastina Israîl guhertinek bihêz avakir. Îsraîl çek û cebilxane bi xemsarî û bêsînor bi kar tîne. Xeza wêran bû. Niha jî heman tişt li Lubnanê tê kirin. Asta rêveberiya rêxistina Hîzbullahê kirin armanc û ji holê rakirin. Îsraîl dixwaze xwe ewle bike. DYE û Ewropa li pişt wê ye, dixwaze sînorên Filistîn û Lubnanê bi temamî bixe bin serweriya xwe, yan di bin dagirkeriyê de bihêle, yan jî bêrûmet bike.
Îsraîl naxwaze bi vê yekê razî bibe. Hewl dide Îranê bikişîne nav şer de, Îranê şer destpê bike. Her çiqas DYA û Îran dibêjin ku em naxwazin şer berfireh bibe jî, rewş ber bi berfirehbûna şer ve diçe. DYA sînoran li ser Îsraîlê ferz nake. Piştgiriya xwe ya siyasî, leşkerî û dîplomatîk didomîne. Îsraîl jî dixwaze bi temamî ji vê yekê sûd werbigire. Netanyahu ji destpêkê ve Îran kiribû armanc. Ez rêxistinên mîna Hamas û Hizbullahê têk bibim jî, rehendên wê dimînin. Lewma jî hewl dide stratejiya xwe ya metingehkirina Îranê bi cih bîne. Îran nexwaze jî tê kişandin nav şerekî wiha. Bi rastî Hesen Nasrallah ne alîgirê şerê bi Îsraîlê re bû. Wî dixwest ku pevçûn bi piştgiriya ji bo Xezzayê sînordar bimîne. Lê Îsraîl bi salan li ser Hizbullahê dixebitî û amadekarî dikir. Hema ku derdor û derfet afirand, êrîşeke piralî û berfireh da destpêkirin. Em ê bibînin ka gelo DYE û Ewropa dê bi dil û can giraniya xwe deynin pişta vê êrîşê da ku nehêlin ev êrîş ber bi Îranê ve biçe.
Di Şerê Cîhanê yê 3'emîn de, dewleta Tirk ya dagirker artêşa xwe wek Îsraîl şand Iraq û Sûriyê û hewildana valakirin û girtina herêmên kurda ya di bin serweriya gelê Kurd de dike. Her wiha dixwaze bi sûdwergirtina ji şer û alozîyê jenosîda Kurdan temam bike. Şer jî li eniya Ukraynayê mezin dibe. Saziyên navneteweyî li wî welatî ne serwerin. Cîhan di serdemeke ne ewle û xeternak re derbas dibe. Şerê cîhanê yê ku bi komploya li dijî Rêber Apo destpê kir, her ku diçe mezin dibe û belav dibe û tevahiya Rojhilata Navîn û Ewropayê di nav xwe de dihewîne.

## Komplo, şerê Sûriyê, şerê Îsraîlê



**Farûk Sakik**

Di hefta borî de, Îsraîl tevgera bejayî da destpêkirin û Îranê bi fuzeyan êrişî Îsraîlê kir.
Îran bi vê êrişê xwest îspat bike ku xwedî hêz e. Heger bêdeng bimaya wê îmaja wan serûbin bibûya. Îranê xwest bi vê hemlê pêşî li vê yekê bigire. Îsraîl jî tevgera bejayî da destpêkirin û her roj windahiyan dide. Ew jî dizanin ku di vî Şerê Sêyemîn ê Cîhanê de, bi hejmara personelên şer hêza dewletekê nayê destnîşankirin. Di şer de kî xwedî teknîkeke şer be, ev esas tê girtin.
Îsraîl li avahiya Neteweyên Yekbûyî nexşeyek nîşan dabû. Di vê nexşeyê de Lubnan, Sûriye, Iraq û Îran reş bû. Ango ev der wê bihatina dagirkirin. Ji bo vê yekê tevgera bejayî lazim bû. Wan jî wisa kir. Çima ecele kirin? Ev biryar bi hilbijartinên Amerîkayê re bi endeks bû. Berî hilbijartinan dixwestin encamê bigirin. Bersiva destpêkê ji Trump hat. Got, divê Îsraîl navendên Îranê yên nukleerî tune bike. Şerê cîhanê anha di vê merheleyê de ye. Dewletên ku ji vî şerî bi bandor dibin jî, ji bo paşeroja xwe hin tedbîran digirin. Tu dewletek an jî hêzek bi awayekî zelal terefê xwe eşkere nake. Hin amadekariyên xwe dike û li benda rewşa defacto disekine.
Tirkiye jî ji van dewletan yek e. Alîgir an jî dijberê kîjan aliyê diyar nake. Amadekariyên xwe dike. Di van amadekariyan de yek jî siyaseta li dijî Kurdan e. Bi Bahçelî dest pê kirin. Ew erkdar kirin. Civaka ku bi serkêşiya MHP'ê, bi dijminatiya Kurdan hatî jehrîkirin, bi tenê bi midaxeleya MHP'ê were îqnakirin. Kompoloya navneteweyî ya li hember Kurdan û Rêber Apo dabûn destpêkirin, encam negirtibû. Ji xwe komplo û Şerê Sêyem ê Cîhanê di heman serdemê de destpêkiribû.
Wan wê demê digot navenda vî şerî Rojhilata Navîn e. Li vê navendê bi navê Abdullah Ocalan kesayetek ku roj bi roj nêrînên wî yê zirar bide berjewendiyên wan belav dibin. Komplo ji bo vê yekê dabûn destpêkirin. Serkêşên komployê jî Amerîka û Îsraîl bûn. Îroj herkesî xwe li gorî şerê Sûriyê dîzayn dike. Herkesî digot di Sûriyê de em ê encam bigirin. Lê wisa nebû.
Amerîka û Tirkiye li dijî Esad, komên cîhadîst perwerde kirin. Erdogan balafira xwe ya wê li Şamê nimêja înê bike amadekiribû. Îsraîl bi siyasetek şerê Sûriyê li gorî peryoda Amerîkayê tevdigeriya.
Di şerê Sûriyê de çibû? Kurd bi ser ketin. Amerîka û Îsraîl dîtin hêzên îslamîst roj bi roj radîkal dibin û ji guhertina sîstema Sûriyê zêdetir, ji bo berjewendiyên xwe tevdigerin. Li ser vê yekê stratejiyeke nû xistin meriyetê. Amerîka ji bo li wê derê bimîne pêdivî bi Kurdan re tevgeriya. Îsraîl dît ku ev hêzên îslamîst ku li Sûriyê bi ser kevin wê piştgirî bidin Hamas û Hîzbûllahê. Wek Amerîka wan jî piştgiriya xwe ya van cîhadistan bi dawî kirin. Îran dema ku dît Amerîka bi hêz dibe, navbeynkarî kir ku Rûsya piştgirî bide rejîma Şamê. Û wisa bû. Di vî şerî de Beşar Esad bi ser ket. Îroj ev enî terk kirin û vegeriyan şerê Îsraîlê. Dewleta Tirkiyê jî vegeriya û ji Sûriyê berê xwe da vî şerê gav bi gav nêzî wan dibe. Kêmaniyên ku di şerê Sûriyê de kiribû ji bo dubare neke, berê xwe da Kurdan. Li Sûriyê bi Kurdan re tevbigeriya, ew pêvajoya muzekereyan dewam bikira, wê encam bigirta û wê ev kaos-qeyrana Tirkiyê ya îroj tunebûya. Tirkiye di sala 2013-2014-2015'an de ji avakirina Komarê heta wê demê serdema herî bi aram dijiya. Nerazîbûna Erdogan a desthilatê, ev welat wêran kir. Îroj ev kêmasiyên xwe dîtin û dîsa berê xwe dane Îmrali. Lê şerm dikin ku têkçûna xwe qebûl bikin. Bi diyaloga Bahçelî û DEM Partî dest pê kirin. Dîrokê, dîsa Kurdan û Rêber Apo mafdar nîşan da ku xeta sêyemîn çareseriya hemû pirsgirêkan e.